

# Bigirnije!



Mamosta: Peyva "şekir" bike di  
risteyekê da!  
Xwendekar: Min ça vexwar.  
Mamosta: O ka "şekir"?  
Xwendekar: Di çayê da helîya  
mamosta!



Babekî zirnayek bo kurê xwe kirî û gotê:  
"Bes tenahîya cîrana têk nedey hal!" Kurikî  
gotê: Te xem pê nebît bab! Ez bes dê bi  
şevê lêdem û hîngê cîran di xewn!

Mamostayî gote xwendekarî: ((Eger  
babê te (5000) dînara bide te birayê  
te û (2000) dînara jî bide te dê  
encam ci bît?))

Xwendekarî bersiv da: ((Encam dê  
şer û pêkdadan bît mamosta!))



Êk çû dixtorê didana da didanekê xwe  
bihelkêşit. Dixtorî bi şasî ve dû didanên wî  
helkêşan. Nexweş tûre bû û gote wî: Min got  
bû te. Didanekê min bîne der te du ïnane der!  
Dixtorî gotê: Başe xwe tûre neke parê êkî bi  
tenê bide!